

Li hember êrîşên dewleta Tirk hêrsa Kurdan mezin dibe

25 Kanûn (Berfanbar), 2009 Weşandin:0811 (GDK), hawarnet.com

[Binivîsîne](#) | [Di blogê de şîrove bike](#) | [Bike Ekranê Mezin](#) | [Ename](#) | [Tomar bike an jî bişîne](#)



AMED, bakûrê Kurdistanê (HAWAR NET) -- Însiyatîfa Gel a Kurdistanê operasyona hevdem a li dijî nûnerên siyasî û şaredariyên kurd bi zimanekî tund şermezar kir.

Însiyatîfa Gel a Kurdistanê operasyona hevdem a li dijî nûnerên siyasî û şaredariyên kurd bi zimanekî tund şermezar kir. Însiyatîfê bang li gelê kurd kir ku li hemberî van êrîşên li ser îradeya gelê kurd bêdeng nemînin û serhildanên giştî bi pêş bixin.

Însiyatîfa Gel a Kurdistanê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku tenê serhildanên giştî yên gel dikare pêşiya siyasîyên îhma û jîholêrakirinê bigirin. Însiyatîfê, destnîşan kir ku pêwîst e gelê kurd, dersekê bide desthilatdariya AKP'ê û dewletê û wiha got: "Operasyonên korsanî, li dijî şaredar û nûnerên ku bi dengên gelê kurd hatine hilbijartin, pêk hatin. Operasyonên korsanî, girtin û kuştin nikare me ji daxwazên me yên azadiyê dûr bixe."

Însiyatîfê, banga serhildana giştî li gelê kurd kir û wiha got: "Gelê kurd vê êrîşa rûmetşikandinê qebûl nake. Pêwîst e, gelê kurd bi giyanê têkoşîn û serhildanên giştî nerazîbûnên xwe nîşan bide. Tenê têkoşîna giştî û serhildanên gelê kurd dikare rê li ber siyasîyên tunekirin û jîholêrakirinê bigire" Însiyatîfa Gel a Gevêrê jî, daxuyand ku li hemberî gelê kurd şerê topyekûn dest pê kiriye.

Di operasyona BDP'ê de 35 kes derxistin Dada Amedê

Di operasyona BDP'ê de 35 kes derxistin dadgehê Di operasyona li dijî Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP) de ji kesên hatibûn binçavkirin jê 35 kes derxistin Dad Amedê.

Nerazîbûnên li hemberî operasyonuna BDP'ê mezin dibin

Di çarçoveya operasyona hevdem a li hemberî BDP'ê ya li 8 bajarên pêk hat û 9 jê şaredar 80 bijartî û siyasetmedar hatin binçavkirin li Wan, Sêrt, Êlih, Qoser, Weranşar bi çalakîyên girseyî hatin şermezarkirin.

WAN

Bi sedan kesên ku li ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya Wanê civîyan, li gel Endamê MYK'a BDP'ê Zahîr Saritaş, Şaredar, Bekîr Kaya, Endamê PM'ya DTP'a hate girtin Hamît Dîlbahar û Serokê Rêxisitna DTP'a hate girtina ê Wanê Selîm Ertaş, Berdevkê Koma Çareserîya Demokratîk û Aştîyê ya Maxmûrê Nurettîn Turgut, Endamê Meclîsa Tirkîyeyê ya M. Şîrîn Tunç jî di nav de, ber bi Kuçeyan Hunerê ve meşîyan. Komê dirûşmeyên "Pêkutî me bêzar nakin", "Bijî Serok Apo" qêriyan. Li ser navê Komê Serokê Rêxistina BDP'ê ya Wanê Muhîttîn Aksîn, diyar kir ku projeya ku qaşa AKP wekî "Aştî û demokrasiyê" bi nav dike, ji aliyê gelê kurd ve gelekî baş tê famkirin û wiha got: "Piştî girtina DTP'ê, li tevahiya Tirkîyeyê, di nav de şaredar, serokên bajarên ên DTP'an hate girtin, endamên Meclîsa Şaredariyê, rêveberên Rêxistinên BDP'ê yên bajar û navçeyan jî di nav de bi giştî 80 kes hatin binçavkirin. Li bajarê me jî heta niha 12 hevalên me hatin girtin. Em van binçavkirinan şermezar dikin û em lazîme hevalên me yên hatin binçavkirin bi lêz bênan berdan."

Piştî daxuyaniya hate dayîn koma ku bi dirûşmeyan heta ber avahiya Şaredariyê meşîya, pişt re belav bû. Li bajar polîsan jî tedbîrên ewlehiyê yên berfireh girtin.

SÊRT

Bi sedan kesên bertek nîşanî binçavkirina Şaredarê Sêrte Selîm Sadak dan, li ber Şaredariyê Sêrtê civîyan û daxuyanî dan çapemeniyê. Di civînê de Rêveberên Rêxistina BDP'ê ya Bajêr, Endamên Meclîsa Giştî, Rêberên SES, Egîftim Sen, ÎHD, SODER, TUHAD DER, Tum Bel-Sen, BES, DÎSK/Genel-İş, MKM, SÎYDER, Yapi Yol-Sen, Haber-Sen, Bariş İnîsiyatifa Dayikên Aştîyê, personelên şaredariyê, keyayên taxan û gelek kesên din amede bûn. Cîgirê Şaredarê Sêrtê Seyfettîn Aydın, daxuyanî xwend. Aydın, bertek nîşanî binçavkirinê da û diyar kir ku hîn 24 saet derbas nebûye ku 94 şaredar derbasî BDP'ê bûne operasyon pêk hatîye. Aydın, anî ziman ku bi vê operasyonê hikûmeta AKP'ê rûyê xwe ye rastî aşkerekî kiriye. Aydın, da zanîn ku polîsên Sêrtê

pêhn li serê Sadak xistine û kirine binçavan û ev nêzîkatiya polîsan şermezar kir. Aydin, da zanîn ku ev nehîqîya li Sadak hatiye kirin li gelê Sêrtê hatiye kirin û ew vê neheqiyê qebûl nakin. Aydin, da zanîn ku bi girantirkirina mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û girtina DTP'ê û herî dawî îro girtina şaredaran sebra kuran diqedîne û xwest di demek nêzîk de ji ser van şaşîyan vegezin. Aydin, destnîşan kir ku gelê kurd û gelê Sêrtê bi van binpêkirin û êrîşan bi paşve gavan navêje û dê têkoşîna xwe xurttir bikin.

ÊLIH

Li Êlihê jî Rêveberiya BDP'ê li ber avahiya partiya xwe daxuyanî da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de Serokê Rêxistina BDP'ê ya Êlihê Mehmetşah Kaygusuz, Cîgirê Serokê Giştî yê BDP'ê Mehmet Şafî Ekîncî, Şaredarên BDP'ê yên Navçeyên Êlihê, endamên meclîsa şaredariyê jî di navde gelek kes amade bûn.

Serokê Rêxistina BDP'ê ya Êlihê Mehmetşah Kaygusuz, jî bertek nîşanî binçavkirinan da û anî ziman ku piştî hîlbijartina 29'ê Adarê êrîşên li dijî wan zêde bûne. Kaygusuz, destnîşan kir ku vê operasyonê wekî îlankirina şer a li dijî gelê kurd dinirxînin û xwest hevalên wan zû serbest werin berdan. Kaygusuz, anî ziman ku ev operasyon li dijî biratiya gelê kurd û tirk e û hikûmeta AKP'ê hişyar kir û xwest dest ji van şaşîyan berde.

Piştî daxuyaniyê bi sedan kesan bi dirûşmeya "Êrîş me bêzar nakin" binçavkirin şermezar kirin.

QOSER

Li Qoserê jî rêveberên BDP'ê û sazîyên sîvîl ên civaki li ber Şaredariya Qoserê daxuyaniyek bi girseyî dan çapemeniyê û binçavkirin şermezar kirin. Cîgirê Şaredarê Qoserê Şerîfe Alp, daxuyanî xwend û wiha got: "Ev pêkanînek dijdemokratîk e. Di serdegirtina malan de cam hatin şikandin, hemû alavên malan tev li hev kirin. Ev binçavkirin li diji vîna gel bêhurmetiyek e. Ev binçavkirinan şermezar dikin û heta şaredarê me serbest bê berdan dê çalakiya me bidome." Piştî daxuyaniyê nîv saetê çalakiya rûniştinê pêk anîn û alên reş bi şaredariyê dakirin.

WÊRANŞAR

Li Wêranşarê jî bi sedan kes li ber avahiya BDP'ê ya Wêranşarê li hev kom bûn û operasyonên li dijî şaredaran şermezar kirin. Di daxuyaniyê de Serokê Rêxistina BDP'ê yê Wêranşarê Mehmet Alî Turk, Serokê Rêxistina DTP'ê ya Rihayê yê berê Îbrahîm Ayhan û rêveberên DTP'a berê bi sedan kes amade bûn. Koma ku ji ber avahiya BDP'ê heta Kolana Rihayê ya berê meşîyan. Komê di meşê de dirûşmeyê "Êrîş me bêzar nakin", "Bijî Serok Apo", "AKP me şaş neke, sebra me nema" berz kirin. Komê piştî meşê li ber avahiya Şaredariya nû ya Wêranşarê daxuyanî da çapemeniyê. Li ser navê komê Mehmet Alî Turk, daxuyanî xwend û diyar kir ku Hikûmeta AKP'ê polîtîka înkâr û îmhaya kurdan didomîne. Turk, anî ziman ku li ser navê hewildana demokratîk

polîtkaya înkare dimeşîne û ew vê yekê qebûl nakin. Turk, da zanîn ku ew dê têkoşina xwe ya aşî û demokrasiyê berwedam bikin.

Piştî daxuyaniyê 10 deqeyan çalakiya rûniştine pêk anîn û belav bûn.

Navên kesên girtî yê gihîştine Navenda Girtî ya BDP`ê ev in:

ŞAREDAR: Şaredarê Cizîrê Aydın Budak, Şaredarê Sêrtê Selîm Sadak, Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn, Şaredara Wêranşarê Leyla Guven, Şaredarê Pirsûsê Ethem Şahîn, Şaredarê Çinarê Ahmet Cengiz, Şaredarê Qoserê Ferhan Turk, Şaredarê Sûrê Abdullah Demirbaş, Şaredarê Êlihê Necdet Atalay.

ŞAREDARÊN BERÊ: Şaredara berê ya Dêrsimê Songul Erol Abdil, Şaredarê berê yê Wêranşarê Emrullah Cîn, Şaredarê berê yê Êlihê Huseyin Kalkan, Şaredarê berê yê Farqînê Fikret Kaya, Şaredarê berê yê Pîranê Abdullah Akengin.

Hevserokê KCD`ê Hatîp Dicle

DTP`YIYÊN BERÊ: Serokê berê yê DTPê yê Bajarê Amedê Fîrat Anli, Cîgirê Şaredarê Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê Alî Şîmşek, Rêveberê DTP`ê yê navçeya Êlihê Aydın Kiliç, Serokê berê yê DTP`ê yê Baja Êlihê Îlyas Saglam, Rêvebera berê ya DTP`ê ya Altındagê Nurhayat Ustundag, Rêveberê DTP`ê yê berê yê Qilabanê Abdullah Urek, Serokê Navçeyê yê berê yê DTP`ê yê Qilabanê Celîl Pîranoglu, Endamê Meclîsa Şaredariya Êlihê yê berê Şîrîn Bağli

HERWIHA: Serokê Şaxê ÎHD`ê yê Amedê Muharrem Erbey, Endama Tevgera Demokratîk a Jina Azad Sakîne Kayra, Ji xebatkarên Yerel Gündem 21 ên Amedê Fethî Suvarî, Serokê DÎSKÎ`yê Yaşar Sari, Parêzer Servet Ozen, Xebatkara Meclîsa Jinan Gulîzar Akar, rêveberê Goç-Der`ê Kerem Çagil, Serokê Şaxê MEYADER`ê yê Wanê Ferzende Abî, Serokê Komeleya Hemwelatîyê Azad a Taxa Hecîbekir a Wanê Tefîk Say

-AMED: Adil Erkek, Bedriye Aydın, Fatma Karaman, Ramazan Debe.

-WAN: M. Sidik Gun, Yıldız Tekîn, Hîlmî Karakaya, Cafer Koçak, Ferzende Abî, Sabîha Duman, Ahmet Makas, Zîhnî Karakaya, Resul Edmen û xwendekarek ku navê wî nehatiye hînkin.

-REHA: Mehmet Beşalti, Muslum Caymaz, Mehmet Çaglayan, İbrahim Halîl Gov, Abdurrezzak İpek,

-ŞIRNEX: Memduh Uren, Necîp Tokgozolu, Samî Paksoy, Omer Yaman, Serbest Paksoy, Mesut Alturk, Hasan Tang, Serdar Tang, Yusuf Tang, Cahit Tang, Ekrem Babat, Segban Bulut, Mustafa Tok, Agît Berek.

Serokê BDP: Em hêvî dikin operasyona dawî be

Serokê Giştîyê Partiya Aştî û Demokrasî (BDP) Demir Çelik, binçavkirina 80 kesî ku di nav de şaredarên partiya wî jî hene wek pêkanînek "Bêheq û bêhiqûq" bi nav kir û got, em hêvî dikin ku, bo demokratîkbûna welatê wê operasyona dawî be.

bdprozetÇelik derbarê mijarê de daxuyaniyek da AKnewsê û got, heta niha 80'ê kes hatine binçavkirin, wan rewşa hevalên xwe pirsyar kirine lê ji ber "nepeniya dosyayê" agahî nedane wan.

Çelik balkişand li ser dema operasyonê jî û got, operasyon piştî ku 94 şaredar derbasî partiya me bûn çêbû ye û ev yek ne tesaduf e û wiha domand:

"Piraniya kesên ku hatine binçavkirin şaredarên DTP'ê bûn û piştî girtina partiyê derbasî me bûn in. Operasyon rojek piştî ku şaredar derbasî partiya me bûne hatiye kirin. Di demek vebûna demokratîk dîsa tê nîqaşkirin û tansiyona kolanan hinek ketiye de hate kirin. Ne li gorî ruha demê ye. Hêvî dikim ku, bo demokratîkbûna welatê operasyona dawî be."

Çelik got, yê ku hatine binçavkirin piraniya wan di îkametgahên diyarde rû dinin û di warê pozîsyona civakî de jî dozger kengê bixwazin dikarin serî li îfadeya wan bidin û bi pêkanînek nehek û bêhiqûq re rû bi rû ne."

Çelik, bang li hikûmetê kir, yê ku hatine binçavkirin bila gavek zûtir serbest bêne berdan û wiha domand:

"Em gelê xwe dawetê aramiyê dikin. Lê di demên pêş de li gorî organên me yê rayedar re em ê mijarê hildin dest û nerazîbûna xwe ya demokratîk deynin holê. Bi gelên Tîrkiye û hêzên demokratîk re dengê xwe yê hevpar em ê ragihînin. Em ê hemberî vê pêkanîne bédeng nemînin."

(çavkaniya giştî: Dîha)